




## Di helbesta Kurdî de hilmeke nû: Awaza Serpêhatîyan

Gabar Çiyan



Sê rêzepirtûkên hêja, "Awaza Serpêhatîyan I, II, III" di 2004 an de li pey hev ji çapê derketin û belav bûn. Ya yekê 120, ya duwê 145, ya sêwemîn jî 175 rûpel e.

Hayê min, ji nivîskartiya Evîn Çîçek bêhtir, ji rojnamevaniya wê hebû. Li welat, paşê jî li Ewropayê rojnamevaniya wê ya lêkolînêrî bala mirovî dikişand. Her wisa li ser pirsra mafê mirovan jî têra xwe çalake bû. Hayê min qet ji helbestvaniya wê tune bû...

Ji xwe ji zû ve di dilê min de hebû ku ji awira helbestê ve berhemên helbestvanên jin bixwînim. Li ser nêrînên wan li cîhanê, jiyane, evîndarî û girêdana bi nîrx û hêjayên welat kur bibim. Nêzî cîhana wan bibim. Hewil bidim ku wan fêma bikim.

"Awaza Serpêhatîyan" hate bi hawara min ve. Ez, ji awira edebî bêhtir li ser hîs û zimanê wê kur bûm.

Helbesta "Koçerê" ez hejandim. Koçerê bi serê xwe dikare bibe mijara romanekî, bibe fîlmek an jî lîstikek şanoyî. Jiyana Koçerê, beşek ji jiyana civata me ye. Bêrîvanî tê de heye. Ked û xwêdana wan, evîndariya li hemberî xwezayê derdikeve pêş. Tevayê rengên jiyana wan, peyvên bi jiyana wan ve girêdayî di helbestê de heye. Bi peyvên, ferhengokek li ser jiyana Koçeran ava kiriye. Rola lehenga helbestê Koçerê herku diçe mezintir dibe. Helbest dibe mîna destanekî. Parastina xwezayê û ya xaka welêt dest pê dike. Berxwedana wê derdikeve pêş:

Koçerê şivanê berxan bû  
Dotvana mîyan bû  
Koçer bêrîvan bû  
...

Pezê xwe re diaxifî  
Alif belav dikir  
Gom paqij dikir  
Maf belavan bû  
...

Fîşek li ezmanê Botan govendê de mane  
Beden heta kûrbûna navikan tî bûne  
Candar hêviya şevanîne  
Ciyên ser banan  
Xeberdana bi stêrkan  
Bayê nîvsar  
Havîn dikir weke bihar  
...

Ezê fîstanê Cizîrê li xwe nekim  
Dest û piyan hine nekim  
Jinmam û mamê xwe re bûkantiyê nekim

Ez mezin nebûme  
Teze me  
Pîvok im  
Naxwazim stêrkên hêviya xwe  
Bi xemgîniyê kil bikim  
Ez dê girêkên salan vekim  
Ez ê konê xwe li ser serê tilikê Cûdî deynim  
Şuna zêrên zer  
Rêxta hêşîn li ser sînga xwe cîh kim...

...

Di helbestên Evîn Çîçek de, lehengên cihê hene. Bêhtir jin in. Bi kar û barê rojane dadikevin. Lê "azadiya jinê bi destê jinê", "helwesta jinê ji bo cihekî bilind di civatê de" gelek caran derdikeve pêş. Ne li benda wê ye ku, "mêr ji bo azadiya jinê helwêsta xwe diyar bike, xebatê bike". Bêhtir ji jinê daxwazî dike ku, "serî netewîne, û şerê adet û toreyên paşdemayî bike". Rola jina şervan û serbixwe di gelek deveran de derdikeve pêşberî mirov:

Ez jin im  
Ez dayik im  
Ez dinîvisînim  
Ez xwedî biryar im  
Ez ne belengaz im  
Ez ne gunehok im  
Ji xwe bawer im  
Min dil ji xebata der ve  
Barê malê hilgirtiyê ser milê xwe  
Ez berheman diafirînim...

...

Rêhevalo, helbestek bilind e. Bi hilmek ji stiranên dilan, ji heyranokên jinan ku bi kul û keser in, barkirî ye. Evîna dil û ya welêt bi hev re derdikeve pêşberî mirov. Hezkirinek wisa bi wate bi peyvên bilind mirovî bi xwe re dibe cîhana helbestvan:

Delalê ber dilê mino  
Nav bexçeyê biyaniyan de stuxwaro  
Ro nedî, bê welat bê waro  
Min digot:  
Ez ê dilê xwe vebikim  
Te re textê zêrîn çêbikim  
Tu berçema xwe şe ke  
Ez ê hemberî te rûnim û seyr kim  
Çipilên evîndariyê çîn bikim  
Li ezaban belav bikim  
Tu şerbeta jiyanê vexwe ez ê tijî kim

Ji şahiyê destan hene kim  
Ez nizamim min çi kir  
Çima min ronî nedî?!  
Ji nohdehsaliya min virde dinê li min bû tarî  
Ez a birîndar  
Ez a xwelî xwarî  
Ji êşa dilê min  
Çavên min de ewr dibare  
Min xweşî hevî dikir  
Diyarî hat bi neyarî...

Helbestvan Evîn Çîçek weke rojnamevan li ser pirsên penaberiye têra xwe kur e. hejmarek pirtûk li ser pirsê bi dirêjî nivîsî ye. Wisa xuyanî dike ku, bandora welatê xerîbiyê ne tenê di lêkolînên wê de, her wisa di helbestên wê de jî pir alî cî girtiye. Êş, kul û keserên xerîbiyê û bêwelatiyê beşek bi serê xwe ye, divê bêne xwendin.

Awaza serpêhatiyan, giraniya helbestên xwe li ser evîna welat in. Beşek jê ji xeyal û hevîyên evîne pêk tên. Helbestvana hêja Evîn Çîçek carna bi hezkirin nêzî jinan dibe, carna bi nefret. Pirsê azadiya jinê bi giranî di gelek helbestan de eşkere, anjî sergirtî derdikeve pêşberî mirov.

Helbestên Çîçek ji awira zaniyariyên herêmî pir dewlemend in. Bi taybetî beşek ji herêma Botanê cî bi cî bi nav dike. Li ser eşîrên herêmê mirov agehdar dike. Jiyana koçertiyê, aşîrên wan, nêzîkbûn û nerîna wan li jiyane derdixîne pêşberî mirov. Gelek peyvên klasîk, xwezayî û şervaniyê diparêze û mîna ferhengokekê pêşkêşî xwendevanan dike.

Dema mirov li helbestên Evîn Çîçek dinêre, di helbestên destpêkê de ji awira edebî û avakirina helbestê de zêde serkevtî xuyanî nakin. Lê Çîçekê di pirtûka xwe ya II û ya III ê ev yek li dawî hiştiye. Xurtbûna wê piralî derdikeve pêş.

Fêmkirina jinê, dîtina cîhana wan ya rengîn, dilên fireh, evîndariya wan ya bilind û welatheziya wan, ji ya mêra pir cihê ye. Têra xwe kur e. Ji bo fêmkirina wan, çend pirtûk têr nake. Nêzîkbûnek ji dil pêwsît e. Parvekirina rêvebirî û xebatê, gavên bingehîn in. Azadî û wekheviya di civatê de dikare me bêhtir nêzî hev bike. Dema wisa bibe û em ji hişkahiya mêr hinekî rizgar bibin, em ê karîbin di şûna wê hişkayîyê de gul û kulîkên rengîn biçînin. Ji helbestên mîna Çîçekê avê wexin, wê wextê em ê karîbin wan baştir fêm bikin...

Dema li welatê me, li KURDISTANÊ, BI TAYBETÎ LI PARÇEYÊ AZAD JINÊN KOLE HEBIN û her meh BI DEHAN JIN BÊNE KÛŞTIN, mirov ne dost, lê neyarê dayika xwe ye, anku li kolebûna jinê digere. Mirov ne mêr, lê dostê jina xwe ye. Di rewşek wisa de jin dibin alet, dibin navgîn. Em dayikên xwe, xwîşkên xwe bi destê xwe dikin kole. Di mercek wisa de jin, kul û keserên xwe bi intihar û darvekirinê dihênin ziman. Wê demê helbest jî têr nakin ku em jinê fêm bikin...

Awaza serpêhatiyan di nav weşanên Perî de derketin. Navnîşana têkiliyê ev e: 0090 216 347 26 44, [perikitap@myonet.com](mailto:perikitap@myonet.com)

## Evîn Çîçek ki ye

Bi eslê ji Herêma Koçgiriye ye, li gundek Sêwasê hatiye dinyê. Bavpîrên wê di serhildana Koçgiriye li dijî Romiyan şer kirine. Çîçek, xwendina destpêkê û lîseyê li Stenbolê dixwîne. Di cunta leşkerî ya 80 î de tê girtin û ji ber dîtinên welatperwerî tê îşkencekirin. Paşê diçe zanîngehê, li ser rêvebirina civakî xwendinê bi dawî dihêne. Di 1983 an de dizewice. Li Sêrtê bi cî dibe. Li ser mafê mirovan xebatê dike. Di ber de rojnamevaniyek aktîf dike. Dikeve bin tehdîtên dewletê û 1990 de xelata mafê mirovan ya HRW digire. 1993 de jê re cezeyên bilind tê birîn. Çîçek derdikeve derveyî welêt. Di zanîngeha Fribourgê de zimanê fransî dixwîne. Gelek pirtûkên wê derketine: Koçgiri Ulusal Kurtuluş hareketi, Seviyorsan savaş, Kadınca Yargılama, Tutkular ve tutsaklar beşek ji xebatên wê ne...

Zarathustra News - [zoroaster@comhem.se](mailto:zoroaster@comhem.se)